Kul û kesereke bêwext

»»»» R:8

Hella hellayeke be’ecokane

»»»» R:2

Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Gştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (289) 05-11-2016 Buha (1000) Tûmen

Daxuyaniya Deftera Siyasî ya PDKÎ der-heq şehîdbûna Se’îd Çurukaya naskirî bi Dr. Silêman

»»»» R:4

Mistefa Hicrî:

Dem, dema kiryarê ye

Nawenda lêkolîna Rojhilata Navîn (MERI) di heyama rojên 4 heya 6’ê Xezelwerê li bajarê Hewlêrê konferansek li jêr navê “Pêşeroja Rojhilata Navîn, kêşe û derfet” bi rê ve bir.

Di panela duyem ya vê konferansê de, hizbên Kurdistanî ên opozisyona rejîma Îranê bas û têbîniyên xwe derheq guhertinên navçe û Îranê û Kurdistanê xistin ber bas. Mistefa Hicrî sekreterê giştî ê PDKÎ di yek ji panelên vê konferansê de helwestên PDKÎ derheq rewşa îro û erkên tevgera Kurd di Kurdistana Îranê û armancên PDKÎ di destpêkirina qonaxa nû ya xebata xwe (rasanê) di vê beşa Kurdistanê de xiste rû.

Sekreterê PDKÎ di vê mijarê de tevî îşarekirina bi ezmûna Komara Îslamî ya Îranê di Kurdistanê de ragehand: «Komara Îslamî ya Îranê gotûbêjan nake, yekem li ber vê ku bawerî bi wan mafan nine. Duyem eva ku em wekî Kurdê Rojhilat faktereke ew qas bihêz nînin ku Komara Îslamî neçar bikin bi gotûbêjê…, ku wisa bû dibe em hewl bidin bibin hêzeke bibandor. Sekreterê giştî ê PDKÎ derheq hizûra pêşmergeyan di navxwe ya Kurdistabnê de ragehand: “Hekî di heyama 20 salên borî de, çi li Kurdistanê û çi li beşên din ên Kurdistanê kêm û zêde hinek xebat hebûye, lê niha piştî 20 salan ji me re eşkere bûye, ku ew yek tu bandorekê li ser siyaset û kiryarên rejîmê nadanê...lê hêza pêşmerge dikare alîkarê vê xebatê be. Eva ku me bas kir ku xebata çiya û bajar pêkve girê bidin, ew her du pêkve dibin ehromeke zextê, bo ser rejîma Komara Îslamî ji aliyekî ve, û ji aliyekî din ve palder e bo vê ku xelkê Kurd bi hêvî ve, tevlî refên xebatê bibin”.

Mistefa Hicrî di beşeke din ya axivtina xwe de ragehand: “Em 20 salan rûniştin û me tenê diruşm dane, me “derdi dil” kiriye, ku Komara Îslamî wisa me dikuje, wisa me diçewsîne, mafê mirovan binpê dike. Komara Îslamî bi van gotinên me, ne siyasetên navxweyî, û ne jî iyasetên derekî guherîne.. lewra wekî rêberatî me biryar daye, ku dibe em bi kiryar pêngavan hilgirin, ew jî dûr ji diruşm û qise. Xelk ji dana diruşman mandî ye, lewra em dixwazin di partîkê de bersiva vê mandîbûna xelkê bidin, nabe jî qet em çaverê bin ku hemû xelkê Kurd yan Îranê bi hev re ji me re bibin alîkar. Lê vê hereketa me di van 2 salên borî de nîşan daye, ku hekî em karê bi kiryar, li dijî Komara Îslamî bikin, eva xelk wê piştgiriya me bike”.

Hesen Şerefî:

“Em pêbend û berpirsyar nînin, di hemberî tu lihevkirinekê, di navbera rejîma Îranê û hikûmeta Herêma Kurdist Kurdistanê de”.

Hesen Şerefî cihgirê sekreterê giştî ê PDKÎ di gotûbêja bi kanala BBC’ê re ragehand ku, em pêbend û berpirsyar nînin di hemberî tu lihevkirineke di navbera rejîma Îranê û Hikûmeta Herêma Kurdistanê de.

Piştî sefera heyeteke Yekîtiya Nîştimanî a Kurdistanê bi serperestiya Wezîrê Navxwe ê Hikûmeta Herêma Kurdistanê bo Tehranê, Nazim Debax bas ji vê kiriye, ku Hikûmeta Herêma Kurdistanê digel partiyên Rojhilat ku di Başûra Kurdistanê de akincî ne, rûniştin hebûye, û ew yek jî lêdwan û baseke zaf di rojeva siyasî de lê ketiye.
Di vê derheqê de,

Dom R:2

Sergotar

Hella hellayeke be'ecokane

Kerîm Perwîzî

Cihgirê fermandê Spaha Pasdaran ya Îranê di civînekê de, bi fermandarên vê spahê re, di Urmiyê, gef li dijminên xwe xwar, ku li her cihekî bin, ewê bikevin pey wan, û wê wan ji nav bibin, herwekî ku berê jî ew kar kirine.

Ew qise û gefên pasdar Selamî di Urmiyê de, di rêûresmekê de bû ku

bi navê rêzgirtina ji kuştiyên spah û Îtila'atê pêk hatibû, û gotina ew kuştî, ew nirx û buha ye ku Spaha Pasdaran di heyama cuda de, di şerê Sûriyê û li parastina sînorên Îranê de daye.

Bixwe ew civîn û ew rêûresm berî her tiştî nîşander û derxerê kuştiyên spahê û hêzên bikirêgirtî ye, ku di heyama çend mehên borî de, û di dijberiya digel Rasan a gelê Kurd de têde çûne, û vê heyamê rejîm li ber barê derûniya hêzên xwe ên serkutkar, hejmara rast ya kuştiyên xwe diveşartin, û cuda ji vê beşa civîna rejîmê, dimîne ser qisên pasdar Selamî, ku di derûna xwe de derxerê çend rastiyan e.

Yekem aliyê wan qiseyan ew e kuherçend ku bi gefxwarin û bi kerb û kîn ve, bara derûniya xwe eşkere dike, û dixwaze ku rûçikê hikûmet û hêzeke xwedî deshilateke bihêz ji xwe û rejîma xwe nîşan bide, lê di rastî de, nîşana vê ye ku ew rejîm heya çi radeyekê, lerzok e, û nîşan dide ku ji kîderê ve ew rejîma derbê dixwe, û riya pêşerojê ji me re diyarî dike, ku em dikarin ji çi xalekê ve rejîmê bixin bin zextê!.

Bi salan bû ku digotin hêzên Kurdî nemane û tê de çûne, û rejîma Komara Îslamî hejmonî bi ser tewahiya navçeyê de heye, lê bi biryara "Rasan" a gelê Rojhilat, ku hêşta di pêngavên destpêkê de ye, û riyeke zaf li pêşiya wê, û pêngavên meztir li pêşiyê ne, rejîm wisa ketiye lerzê, û berpirs û fermandarên Spaha Pasdran a terorîst û destûpêwendiyên wê, zû

Pirtûka "mirovek li ser piyan" ji nivîsîna Dr. Firêdrîk Têso hate nîşandan

Pirtûka "mirovek li ser piyan" ji nivîsîna Dr. Firêdrîk Têso hevalê nêzîk ê Dr. Qasimlo li bajarê Silêmaniyê de hate nîşandayîn.

Roja Yekşemiyê heyeteke Komîsyona Ragehandinê a PDKÎ li roja 9'ê Xezelwerê beşdarî di rêûresma nîşandana Pirtûka "mirovek li ser piyan" ji nivîsîna Dr. Firêdrîk Têso, dostê nêzîk ê Dr. Qasimlo de kir, ku di nawenda çapemeniya "Xezelnûs" li bajarê Silêmaniyê de bi rê ve çû.

Di vê rêûresmê de heyeteke Deftera Nûnertiya PDKÎ li bajarê Silêmaniyê bi serperestiya Tahir Mehmûdî jî beşdar bû.

Di vê rêûresmê de, Tahir Mehmûdî endamê Komîteya Nawendî ya PDKÎ, sê bergên kitêban, ku li ser dîtingeh û nivîsîn Dr.Qasimlo hatibûn nivîsandin, yan jî hatibûn wergerandin, pêşkêşî Dr. Têso kir.

Dr. Firêdrîk Têso bi beşdariya nivîseran, û endamên nawenda çapemeniya Xezelnûs, û hejmarek ji wergerên Kurd, pirtûka xwe ya bi navê "mirovek li ser piyan" nîşan da.

Di destpêkê de Dr. Firêdrîk Têso kêfxweşiya xwe nîşan da, ku cardin xwe di nava koma dostên xwe de dibîne, û hêvî xwest ku bikare hertim

di nava wan dostên xwe de be, û hertim xizmeta gelê Kurd bike.

piştre navbirî got ku ez vê pirtûkê pêşkêşî Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî dikim, ku dostên herî mezin ên min bûne.

piştre navbirî bas ji vê kir, ku ez hez dikim ku vê pirtûkê û gellek pirtûkên din, li Kurdistana Rojhilat çap bikim, lê rewşa siyasî li Îranê û rejîma Îranê, ew derfet ji her kesî standiye û serkuta xelkê dike.

wî qala vê yekê jî kir ku niha derfeta herî baş e bo serbixweyiya Kurdistanê, û dibe vê derfetê ji dest nedin, jiber ku piraniya welatên Erebî û Rojavayî piştevaniyê ji serbixweyiya Kurdistanê dikin, û dizanin ku Kurd dostê rasteqîne ê azadî û denokrasiyê ye.

Herwis bas ji vê kir, ku bi boçûna wî Kurd ne tenê li perçeyekê de, belkû li her beşeke Kurdistanê de, mafê wê heye ku dewleta xwe hebe û bixwe xwe îdare bike. Dr. Firêdrîk Têso di dawiyê de, dîsan got ku ew kêfxweş e ku xwe di Kurdistanê de dibîne.

Doma R:1

kanala BBC'ê bi Hesen Şerefî re gotûbêjek pêk anî, û di vê derheqê de bas ji vê kir, ku em berpirs nînin, di hemberî tu lihevkirinekê di navbera rejîma Îranê û Hikûmeta Herêma Kurdistanê de, û ew gefên ku rejîma Îranê li ser Herêma Kurdistanê pêk tîne, em dîsan di hember de berpirs nînin.

Şerefî herwisa di bersiva vê pirsê de, ku hekî partiyên Rojhilata pêbendî vê lihevkirinê nebin, dibe çaverêyê helwest û dijkiryaran bin, got: "Yekem eva ku şer û pevçûn li ser navçeyên sînorî bibin, dûr e ji her rastiyekê, û ew şer di nava kûrahiya xaka Kurdistanê de bûne. Herwisa rejîma Îranê pêştir jî bi hêcetên cur bi cur gef li Hikûmeta Herêma Kurdistanê xwarine, û zext jê re anîne, û di van dawiyane de jî serdar Husên Selamî cihgirê giştî ê fermandê Spaha Pasdaran a rejîma Îranê, gefa terorê li endamên partiyên Rojhilata Kurdistanê ên di Herêma Kurdistanê de xwarine.

Cihgirê sekreterê giştî ê PDKÎ derheq danûstandina digel rejîma Îranê bas ji vê kir ku ji dîtingeha îdeolojî ve, Komara Îslamî bawerî bi maf û daxwazkariyên me nine, lewra tiştek bi navê danûstandina digel rejîma Îranê bê wate ye, û piştre em wekî PDKÎ, me ezmûneke tal di gotûbêja bi vê rejîmê re heye, û di derbazbûyî de jî, bi hêceta gotûbêjê, Dr. Qasimlo li ser maseya gotûbêjê li Viyenê şehîd kirin, lewra tu danûstandinek digel vê rejîmê encama wê tunabe.

zû dest dikin bi gefxwarina û hawar hawarê. Rasanê hemû hejmoniya derûniya rejîmê kiriye bilqa ser avê.
Ji aliyekî din ve, ew gefxwarina tirsinokane ya Spaha Pûasdran vê rastiyê diselimîne ku rejîma Îranê, her demekê ku di qada siyasetê û berêkaniya rewa de, kêm tîne, berbirûyê şikestê dibe, hawar xwe dibe ber kiryarên nerewa û terorîstî, lewra bi hemû awayekî gefa derbelêdana li dijminan li her cihekî dinyayê de dikin, û gurzên giran li neyaran xwe didin ku ew jî heman terora neyaran e li derveyî welat.

Herwekî ku salên berê ku Felahiyan bas ji şopandina dijminên nîzamê kir, û terora Berlînê lê ket, û vê carê jî pasdar Selamî , bêçareyî û tirs û zendeqa xwe, bi gefa terorî dipeçêvin.

Termê şehîd Resûl Mihemedzade di cimata şehîdan a PDKÎ de bi axê hate spartin

Hesen Şerefî:

Herçend ku termê pîroz ê vî xebatkarê sadiq û rastgo, me bi axê spart, lê em malbata Demokrat, emê dirêjîderê riya Şehîd Resûl Mihemedzade û hemû şehîdên Kurdistanê bibin”.

Pêşnîvroya roja Pêncşemiyê 6’ê Xezelwerê 1395’an ya Rojî, termê şehîd Resûl Mihemedzade berpirsê fêrgeha Komîsyona Perwerde ya PDKÎ bi beşdariya Mistefa Hicrî sekreterê giştî û endamên rêberî û kadr û pêşmergeyên PDKÎ û komek berçav ji partî û alî û kesayetiyên siyasî ên mêhvan, piştî rêje û “san” a leşkerî bona rêzgirtin ji xebat û tekoşîn û pîşwazî ji termê şehîd Resûl Mihemedzade di cimata Şehîdan a vê partiyê de bi axê hate spartin.

Piştre Hesen Şerefî cihgirê sekreterê giştî ê PDKÎ bi nûnertiya ji aliyê Deftera Siyasî ya PDKÎ çend gotinek pêşkêş kiorin.

Hesen Şerefî destpêkê de, bixêrhatina hemû hizb û aliyên siyasî û kesayetî û mêhvanên beşdar di vê rêûresmê de kir û bas ji vê kir: “Şehîd Resûl Mihemedzade di PDKÎ de perwerde bibû, lewra wisa kurek welatparêz û neteweyî bû, û li ser xaka beşeke din ji Kurdistanê bo xizmet bi gel û nîştimana xwe şehîd bû, û selimand ku xortekî emegdar û rasteqîne ê gelê xwe ye”.

Şerefî di beşeke din ya axivtina xwe de bas ji vê kir ku: “Herçend ku termê pîroz ê vî xebatkarê sadiq û rastgo, me bi axê spart, lê em malbata Demokrat, emê dirêjîderê riya Şehîd Resûl Mihemedzade û hemû şehîdên Kurdistanê bibin”.

Anavbirî di dawiyê de, spasiya hemû partî û aliyan û kesayetiyên beşdar div ê rêûresmê d ekir.

Piştre “Kinêre Mêhfer” hevjîna Şehîd Resûl Mihemedzade çend gotinek pêşkêş kirin.

Kinêre Mêhfer di axavtina xwe de, spasiya hemû endamên PDKÎ kir, ku di xema Şehîd Resûl Mihemedzade de beşdar bûn, û got: “Emê bi piştevaniya hevdu, emê armancên Şehîd Resûl Mihemedzade û hemû şehîdên Kurdistanê bi cih bînin, û herwisa bas ji vê kir, ku Şehîd Resûl Mihemedzade hertim digot, ez di her cihekî Kurdistanê xizmetê bikim, ji min re cihê şanaziyê ye, lewra bi şanazî ve, di vê riyê d eşehîd bû”.

Daxuyaniya Deftera Siyasî ya PDKÎ derheq şehîdbûna Se'îd Çurukaya naskirî bi Dr. Silêman

Derheq şehîdbûna pêşmergeyekî Kurdistanê, Deftera Siyasî ya PDKÎ daxuyaniyek belav kir ku deqa wê wiha ye:

Daxuyaniya Deftera Siyasî ya PDKÎ derheq şehîdbûna pêşmergeyekî Kurdistanê

Roja Yekşemiyê 9'ê Xezelwera 1395'an a Rojî, (30.10.2016)'an, pêşmergeyê fîdakar, Se'îd Çurukaya naskirî bi Dr. Silêman, li nexweşxaneyekê di welatê Almanyayê de, canê xwe pêşkêşî riya rizgariya Kurdistanê kir, û şehîd bû.

Dr. Silêman li Bakura nîştiman ji dayîk bû, û di hemû parên Kurdistanê de, li pêxema rizgariya xaka Kurdistanê û bexteweriya neteweya xwe de, riha xwe gorî kir, û pêşmergeyekî rasteqîne ê Kurdistanê bû.

Hevalê şehîd Se'îd Çurukaya naskirî bi Dr. Silêman, tevî xwendina li asta bilin û di zanîngehên derve de, û tevî jiyana asûde li welatekî pêşkevtî wekî Almanyayê de, vê carê jî, dest ji asûdeyiya xwe hilgirt, û vegeriya nava karwanê xebata azadîxwaziyê, û li dijî terorîzmê û êrîşberên ser Kurdistanê xebat kir.

Dr. Silêman yekem car jî xwendina xwe bi cih hêlabû, û di karwanê rizgarîxwaziya Kurdistanê de beşdarî kiribû, vê carê jî, li başûra nîştiman li dijî terorîstan sekinî, û di vê heyamê de, di gel "rasan" a Rojhilat, hevsozê rasanê bû, û digel rêbaza azadîxwaziya Rojhilata Kurdistanê hevsozî û alîkarî kir.

Se'îd Çurukaya naskirî bi Dr. Silêman, rahêner û şarezayekî baş ê biyavê dijî teqînan û dijî mayînan bû, û bi sedan pêşmergeyên Kurdistanê di vî warî de pê gehandibûn, û bi hezaran mayînan pûç kiribû, û riha hezaran poêşmergeyan ji tevlikên terorîstan parastibû.

Deftera Siyasî ya PDKÎ tevî vê ku şanaziyê bi kesên welatparêz û xebatkar ên wekî Se'îd Çurukaya naskirî bi Dr. Silêman dike, û tevî bibîranîna vê ku, li dîroka rizgarîxwaziya Kurd

de, mînakên van cure hevpêwendiyan û beşdariya Kurdan, di xebata beşên din de zaf in, sersaxiyê dibêje malbata birêz Se'îd Çurukaya naskirî bi Dr. Silêman,û xwe hevxemê wan dizane, jiber ku jidestdayîna Se'îd Çurukaya naskirî bi Dr. Silêman xisarek bû, bo hemû Kurdistanê.

Riha wî şad be, û riya wî ya pirr ji serwerî pirr rêvîng be

PDKÎ
Deftera Siyasî

10.08.1395
31.10.2016

Jineke pêşmerge, û hevjîna pêşmergeyekî şehîdê rêya azadiyê, koça dawiyê kir

Jine pêşmergeyekî kevnar û hevjîna pêşmergeyekî şehîdê rêya azadiyê,bi sedema nesaxiyê,di nexweşxaneyeke bajarê Kirmaşanê de koça dawiyê kir.

Li gorî nûçeya gihîştî bi malpera Kurdistanmedia,''Selma Qobadî'' jine pêşmergeyekî kevnar û hevjîna pêşmergeyekî şehîd, bi navê ''Fetah Fetahî''xelkê dewera Zerdûyiya ser bi bajarê Pawê, di dema sibezûya roja Duşemiyê rêkewt 10'ê Xezelwera sala 1395' an ya Rojî,piştî demekê ku bi nexwaşiya şêrpençê(seretan) tûşbibû,li temenê 78 saliyê de,di nexweşxaneya Îmam Riza, li bajarê kirmanşanê de koça axiretê kir.

Dade Selma Qobadî, keça xwdê jê razî,Mîrza Ehmed Qobadî ye, û sala 1317' an ya Rojî li gundê ''Riwan'' a ser bi dewera Zerdûyiyê, cave xwe bi rûyê dinyyaê vedike, û piştî serkevtina şoreşa gelên Îranê, û êrîşa hovaneya komara Îslamî, bi ser gelê Kurd di kurdistanê de, Selma Qobadî,di gel hevjîna xwe, şehîd Fetah Fetahî,tevlî refên pêşmergên PDKÎ dibin, û bi dilsozî û emegdariya xwe bi gel û nîştiman, û rûmetxweşiya xwe bûne çihê bawerî û xweşnaviyê di nava hevalên pêşmerge û xelkê herêmê.

Dade Selma di nava xelkê devera xwe de, cihê rêz û hurmeteke taybetî bû, û li dawî demên jiyana xwe de ragehand ku ez hertim pêşmergê PDKÎ me,û gotibû ku peyama piştgîrî û wefadariya min bi hemû xebatkarên PDKÎ ragehînin. Şehîd ''Fetah Fetahî'' pêşmergeyekî mirxas yê hêza Şaho ya PDKÎ,û hevjîna dade selmayê li rêkewt 28' ê Cozerdana sala 1365' an ya Rojî,di şer û pevçûnekê bi kirêgirtiyên rejîmê re, di nava awahiya ''Dişe'' ya ser bi devera Hewramenê, şehîd dibe, û tevlî karwanê şehîdên rêya azadiya gel û welat dibe.

PDKÎ bo vegerandina yekcarî ya xaka Kurdistanê şehîd da

Elborz Rû'înten

Di sala borî de, PDKÎ saleke dijwar bi rê kir. Renge biprsin ku kîjan sala vê hizbê bi dijwarî derbaz nebûye, bê guman rast e ku eva jî vedigere ser hestkirina bi berpirsayteiya li hemberî vê erkê ku li ser milê vê hizbê hatiye danîn.

Dema ku xwe di hemberî gel û nîştiman de berpirsyar dizanî, bê guman gellek qurbanî û fîdakarî pêwîst e, ku dîroka PDKÎ pirr e ji vê qurbandanê. Heya hinek caran dibêjin ku her PDKÎ ye ku dikare vê hemî azarê bibîne, û her berdewam û pêdagirtir be, li ser xebatê, û pêngavên bihêztir bo pêşerojê hilgire.

Mînaka vê fîdakariyê şehîdbûna Resûl Mihemedzade, kadrê xwedî vec, ê PDKÎ ye, ku li bereyên şer ê li Mûsilê bo hertim navê xwe di nava dilê gel û welat de tomar kir. Jidestdayîna xortekî din, ê mekteba Demokrat bo gel û nîştiman derdixe ku, vê partiyê hertim berjewendiyên neteweyî û Kurdistanî berî her tiştî daniye.

PDKÎ bi dirêjahiya temenê xwe, ew siyaset peyrew kiriye, lê renge kêmtir xwendin jê re hatibe kirin. Bona derketina vê mijarê, destpêkê dibe ji siyaseta hizbê di hemberî Başûra Kurdistanê em hûr bin, ku ew partiya tevî hemû şiyanên xwe, û hebûna gellek êş û azaran, û dijberî û pilanên bê hejmar û gemar ên dijmin, cuda ji berjewndî û piştevaniya eşkere û veşartî ya ji hikmeta Herêm li Başûr, armanceke wê ya din nebûye. Ew piştevaniya xwe di sê qonaxên pêş raperîn, û dema raperînê û piştî raperînê de dibîne, û her carê û bi awayekî Kurdistanîbûna xwe selimandiye.

Hertim fakterek bûye, bo lihevnêzîkkirina hizb û aliyên Başûr, ji ber ku dostatiya hemiyan kiriye, û rêz ji nawendên wekî hikûmet û parlemanê girtiye. Tu demekê di demên herî dijwar de jî, hawara xwe bo dijminê Kurd li dijî Kurd nebiriye, û heya bo vê siyasetê jî, gellek qurbanî daye. Ew binemayên exlaqî ên hizbê, lewra giring in, û dibe bi hemû awayekî bi hezaran carî bêne gotin, û bibin sermeşqa siyaseta aliyên din jî, jiber ku beşek ji bêbextiyên gelê Kurd vedigere ser nebûna siyaseteke Kurdistanî. Lewra jî ku em dibînin hizbek bi vî awayî berçav digre, dibe wekî xaleke bihêz û erênî ya vê hizbê çav lê bê kirin, dema ku şehîd Resûl Mihemedzade, digel beşa endaziyariya pûçkirina mîn û teqemeniyên DAÎŞ'ê li bereyên herî pêş ên operasiyoneke girîng ya wekî şerê DAÎŞ'ê di dema pûçkirina minê de, ku girîngtirîn taktîka DAÎŞ'ê ye, bo şehîdkirina pêşmerge, erka xwe bo parastina bi hezaran pêşmerge encam dide, û di vê riyê de şehîd bû, ku kesên wekî me nedizanîn, ku ew berpirsê fêrgeha komîsyona Perwerdehiya PDKÎ ye, û ew û kadrên vê hizbê, mijûlî karekî nîştimanî ne.

Hekî li gora siyaseteke teng ya hizbî û jixwehezkirin ba, eva dibe PDKÎ meztirîn propagende bi karekî wisa kiriba, lê vegeriyana bo binemayên nîştimanî wisa kirin ku heya dema şehîdbûyîna vî kadrê kêrhatî, em agehdarî vê erkê nebin. Wate hizb, tenê bo parastina nîştimana Kurd û Kudristan karekî bi vî rengî kiriye. Ji aliyekî din ve şehîd bûna di pêxema xaka nîştiman di mekteba Demokrat de sînoran nas nake, û li her cihekî ku hewce bi hizbê û xortên wê hebe, bê çavnihêrîkirina ji deskewteke hizbî, amade ye ku ew erka ku dikeve ser milên wê, encam bide. Îca ew erk bergirîkirin be di hemberî hêzên terorîstî ên Komara Îslamî yan DAÎŞ'ekê, ku di siyasetên xwe de, rûyeke din a Komara Îslamî ya Îranê be di herêmê de. Ew çende bo her çar perçeyên Kurdistanê, siyaseteke neguher ya hizbê ye, di demekê de ku serbarê hebûna têbîniyan li ser siyaseta aliyekî, lê ji bo yekxistin û derxistina rêjeya Kurd di hilbijartinên Bakura Kurdistanê, di kongireyeke rojnamevanî de, piştevaniya xwe bo HDP radigehîne, di her kom û civînekê de pêdagiriyê li ser yekîtî û yekgirtina di navbera aliyên siyasî ên Rojava, bi armanca gihîştina bi mafên xwe di vê parçeyê de dike.

Serêşe nebûn bo tu Kurdekî û heya xwînrijandin bo parastina pêşmerge û deskewt bo berhemên nîştimanî wisa kiriye ku ne bi gotar, belku di piratîkê de jî, mînakeke baş e bo siyasetên Kurdistanî ên PDKÎ di herêmê de, ku nîşan dide, ku hebûna hêzeke wisa karîgeriya erênî heye bo hemû Kurdistanê.

Biyaveke din ya vê siyasetê vedigere bo têza piştevaniya Kurd, di hemberî dewletên dagîrkar û dijminê Kurd. Helandina berjewendiya hizbê bo berjewendiya Kurd wisa dike, ku bikare siyaseteke bi vî rengî berçav bigre. Hekî bê û ew biyav wekî beşek ji siyaseta hemû aliyan be, eva pêngavên girîng dibe, bo Kurd û Kudristanê.

Di dawiyê de çîroka şehîd Resûl ku mamostayekî fêrgeha PDKÎ bû, bo pêgehandina lawên welatparêz, di çarçoveya mekteba demokrat, eva bixwe waneya herî mezin e bo vê ku çawa em bikarin xizmeta Kurdistanê bikin, û çawa em xwe pê bigehînin, û ya ku me bi dest xistiye, çawa di xizmeta şoreşê de bi kar bînin. Xortekî bajarê Seqizê di destpêka pêşmergatiyê de dibe pêşmergeyeke hizbê, û pileyên pêşmergatiyê û kadriyê wekî yekem derbaz dike, û piştre li zankoya Selahedîn, beşa Dîrokê bi dawî tîne, û cardin vedigere nava refên şoreş û tekoşînê, û piştre mamostatiya fêrgehê dike û gellek ciwanan pê digehîne, û bi sedema kêrhatîbûna di beşeke hestiyar ya şer, wate pûçkirina mayînan di operasiyona diyarîkirina yekcarî ya sînorê Kurdistanê pêşmerge diparêze, û jiyana xwe fîdayê Kurd û Kurdistanê dike, lewra ez vê çîrokê bi rengvedaneke din ya siyaseteke Kurdistanî ya PDKÎ dizanim.

Mînaka vê fîdakariyê, şehîdbûna Resûl Mihemedzade, kadrê xwedî vec ê PDKÎ ye, ku li bereyên şerê li Mûsilê bo hertim navê xwe di nava dilê gel û welat de tomar kir

Kurdistan - Pêşmerge Se'îd Çurukkaya Girt Hembêza Xwe!

Cemal Batun

Di 29'ê meha Cotmehê de, aga-hiya şehîdbûna Dr. Suleyman (Sait) Çurukkaya xemgîniyek mezin li gel raya gîştî ya Kurd / Kurdistanî peyda kir. Gelek taybetmendiyên şehîd Çurukkaya hebûn, ku cîhêk xwe yê taybet, di dilê welatparêzên Kurdistanê de pêkanîbû. Li Bakur û Başûrê Kurdistanê di nav doza rizgariya Kurdistanê de, her û her di qadên zehmet, berxweder û herweha pêşengiyê de cîh girtibû. Her dem bi rêzdarî, nefsbiçûkî û dilovaniyê li gel rêheval û gelê xwe şopa xwe danîbû. Şehîd Sait Çurukkaya di sala 1968an de li gundê Çilkanî ya Çewlîgê hatiyê dinê.

Dibistana seretayî, navîn û gimnasi-umê li Çewlîgê dixwîne. Çurukkaya xwendevanek gelek jêhatî û zîrek e. Yekser piştî qedandina liseyê Za-nîngeha TIB (doktorî) ya Uniwersit-eya Çukurova qezenc dike. Gava di sala sêyem a di zanîngehê de ye, di sala 1990an de dibe endamê Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK).

Piştî endametiyê derbasî Lubnanê dibe û perwerdeya partiyetî li Aka-demiya Mahsum Korkmaz li Bekaa dibîne. Heman salê vedigere devera Çukurova û dibe çalakvanê şerê nav bajaran.
Di destpêka sala 1991'an de tê tes-bîtkirin û gava metirsiya man a wî li devera Çukurova rû dide, derbasî Di-yarbekrê dibe û piştî demek kurt erkên fermandariyê li herêma Diyarbekrê de werdigire. Çurukkaya karînên xwe yên pêşengiyê di nav xebata xwe de diyar dike û di sala 1993an de dibe Cïgirê Fermandarê Diyarbekrê yê wilayetên Çewlîg û Erzurumê digre nav xwe.
Di sala 1995an de Fermandarê Giştî yê eyaletên Xerzan, Eyaletên Navîn û Diyarbekrê ye. Heman salê wekî endamê Komîteya Navendî ya PKK tê hilbijartin. Sala 1996an carek din der-basî perwerdeya Akademiya Partî dibe û herweha li Suriye li gel Abdullah Ocalan dimîn e. Dawiya salê vedigere Diyarbekrê û Fermandarê Eyalet a Di-yarbekrê ye. 1997 - 1998an li Başûrê Kurdistanê li deverên Zap, Xakurk û Qendilê ye. Beşdariyê di Kongreya 6em û 7em a PKK de dike.

Gava sala 2000'an (ku piştî girtina Abdullah Ocalan e) PKK armancên xwe diguherîne û rêvebiriya xweser, xweseriya demokratîk dibin hedefên sereke yên PKK, Çurukkaya van guherînên bîngehîn qebûl nake û li gel gelek hevalên xwe ji PKK vediqete û Insiyatifa Azadiyê ava dike. Lê, piştî ku dibîne nikarin bi awayek gelemperî xebata xwe di nav Bakurê Kurdis-tanê de qayim bikin, Insiyatifa xwe hildiweşînin û ew dawiya sala 2000an de diçe Almanyayê.

Çurukkaya li Almanya, di warê Civat-nasî de, zanîngehê dixwîne û piştî qe-dandina xwendinê dikeve nav xebata bazirganiyê de. Li gor zanyariyan, di vî warî de jî pêşdikeve.

Lê, gava DAIŞ êrîşî Kurdistanê dike. Başûrê Kurdistanê carek din dibe wargehê têkoşînê ji bo azadîya Kurd-istanê, Çurukkaya wekî dibêje: nikare tenê ji Ewrûpa ve li vî şerî temaşe bike. Tê Kurdistanê! Dibe pêşmerge, dibe Fermander! Dibe pîsporê têkbi-rina mîn ên dijminê Kurdistanê.

Dibe rêhevalê bi hezarên pêşmergeyên Kurdistanê re. Heta roja dawî ya jiyana xwe - li devera Başîk, gava dixwaze mîn ên DAIŞ a terorîst têk bibe, dibe parezvanê hevalên xwe yên pêşmerge, dibe parezvanê welatê xwe - Kurdistanê!. Ne terorîst ên DAIŞ, ne dijminên azadiya Kurdistanê vêca tu caran dê bi wî nikarin - ji bo ku wî di dilê Kurd / Kurdistanê de xebata xwe, doza xwe, têkoşîna xwe, baweriya xwe çandiye. Ew jî Kurdistan e! Kurdistan a Dr. Se'îd, Kurdistan a me hemûyan!...

Nerîna Lîderan

Demîrtaş: “Tendurustiya min baş e, û morala min bihêz e”.

Obama: “Tramp hekî biber serkomar, gef e li ser asayişa hemû cîhanê”

Tramp: “Girîng ew e ku Obama çar salên din serkomar nabe”.

Baxçelî: “Em alîgirê cezayê bidarvekirinê ne”.

Hevserokên HDP’ê û neh parlemantar hatin girtin

Polîsê Tirkiyê hevserokên HDP’ê û 9 kes ji parlemantarên Kurd destbiser kirin.

Li gora raporên ku hatin belavkirin, berpirsyarên dewleta Tirkiyê 9 parlemantarên Kurd bi navên Sirî Sûreya Onder, Îdrîs Baloken, Ziya Pîr, Nûrsel Aydoxan, Leyla Bîrlîk, Selma Îrmak, Ebdullah Zeydan û Gulser Yildirim destbiser kirin.

Herwisa Wezareta Navxwe ya Tirkiyê, di daxuyaniyekê de ragehand ku li gora biryara dawakarê gişti li Amedê, Şiranx, Colemêrg, Wan Çewligê 11 parlemantar hatin girtin, û du parlemantarên din jî bi navên Feysel Saryildiz, û Toxba Hezer biryara girtina wan hate derkirin.
Demîrtaş hevserokê giştî ê HDP’ê di dema guherînkariya di destûrê de, li konferanseke çapemeniyê de ragehandibû ku tu yek ji hevalên me bi piyên xwe naçin dadgehê.

Demîrtaş di doma axavtina xwe de bas ji vê kiribû, ku dewleta Tirkiyê bi zorî dixwaze lêpêçînê li me bike, ku ew yek jî mehal e.

Dawakarê giştî yê Komara Tirkiyê li Amedê de, di daxuyaniyekê de ragehandibû ku parlemantarên HDP, bi tohmeta endametiya li rêkxiraweke terorîstî ya çekdar de hatine girtin.

Tehrîmên Amerîkayê li ser şîrketa firokevaniya Mahanê di cihê xwe de ye

Can Kirbî gotiye ku tehrîmên Amerîkayê derheq vê şîrketê di cihê xwe de ye.

Li gora nûçegihaniyan, Can Kirbî berdevkê Wezareta Karê Derve ya Amerîkayê, li dijkiryara bi raporekê li derbarê şîrketa firokevaniya Mahan ku ji aliyê Spaha Pasdaran ve tê piştgirîkirin, gotiye ku tehrîmên Amerîkayê derheq vê şîrketê di cihê xwe de ye.

Şîrketa firokevaniya Mahanê, ku girêdayî Spaha Pasdaran e, bo zêdetir ji deh welatên Asyayî û Ewropî firîna tîcarî heye.
Ji dîtingeha Wezareta Xizînedariya Amerîkayê ve, şîrketa Mahanê, alîkariyeke gellek nêzîk digel Spaha

Pasdaran heye, bi taybetî digel çiqa wê ya derveyî sînor, wate hêza terorîstî ya Quds.
Amerîkayê ragehandiye ku ew alîkariya nêzîk bo mînak veguhastina çek û teqemeniyan, bo welatên wekî Sûriyê û Lubnanê ye. “Mahan Air” ji sala 1390’î ve, di rîzbenda tehrîmên Amerîkayê de ye. Amerîkayê 19 kes û şîrketên ku tawabar in di “dellalî” ya bo vê şîrketê, tehrîm kir.
Can Kirbî, ragehandiye ku tehrîmên me li dijî vê şîrketê, wê berdewam bin, û me tu niyetek bo guhartina wê tune ye.

Yekîneyeke berhemanînê, kesên leşkerî werdigre

Nêzî 15 kes ji pirsonelên xanenişînkirî ên hêza Întizamî ya rejîmê, di komanyayeke berhemanîna çimentoyê di Bîcarê de kar dikin.

Li gora rapora nûçegihanê “Kurdistanmedia”yê, karxaneya çimentoyê ya Kurdistanê li Bîcarê de, beşa nobedariyê daye destê peymankarên taybet, û wan ji dest kirine bi wergirtina kesên nizamî (leşkerî)ên xanenişînkirî.

Yek ji wan leşkeriyên xanenişînbûyî, ku di beşa nobedariyê de hatiye wergirtin, ji endamên pêşîn ê NACA’yê ye. Di doma vê raporê de hatiye ku di 2 salên borî de, zêdetir ji 250 kes ji karker û karsazên kompanyaya

Çimentoya Kurdistanê xaenişîn bûne.

Wergirtina kesên leşkerî, di demekê de ye, ku serokê vê şîrketê, di bin zexta çalakên kedkarî de, wergirtina kesên ne xwecihî ragirtibû.

Nirxa bêkariyê di parêzgeha Kurdistanê de %20 em ku di raserî welat de, pileya sêyem heye.

Kul û kesereke bêwext

N: Luqman Mêhfer

Taze em li herêmên azadkirî, pêngav bi pêngav ji quntarên çiyayan hildikişiyan, û rûpeleke nû ji xebatê dest pê dikir, û kêm kes hebûn, ku bikarin taba vê qonaxa dijwar û bizehmet bînin. Yên ku ew şanazî û ji xwe bihorîn, û cangorîtî dibû para wan, her keç û kurên mekteba Demokrat bûn, ku li aliyê din ê sînorên destçêkirî, di demsala buharê de, per û baskên xwe vedikirin, û wekî avjenekî şareza di nava behra pirr şîpel ya gel de, gemiya xwezî û hêviya Kurd ber bi girava armancên xwe ve diherikand. Buhareke sirr û sar e, û hêşta gullale û gezîze û şilêran serî di bin xaka quntara çiyayan de ranekirine. Hêşta Qendîlê kofiya xwe ba nedaye, û ser heya pê spîpoş e, û deştên Lacanê sor, û Pîran jî taze bi rengê kes xwe dixemilîne, derberûyên daristana berê Mêrgan jî, her çilû nedane, û bajar li pêşwaziya bazên koçkirî ên Germiyanê de ye.

2'ê Banemera sala 1365'an e, deste deste baz bi bejn û balê Qendîlê ve jêhel dicing, û destên xwe di nava pirça Şêx Ayişeya taze di bin befrê de derketî de, tînin û dibin. Karwaneke bê binî li rê de ye, her ji Şaho û Nekerozê ve heya Agirî ketiye rê, bi bê bêhnvedan, diçe û rê dibire. Ji esman ve stêrkeke geş ber bi erdê rakêşaye, û li çiya gulek şilêr çilmisî, û li ber derwazeya bajar, fermandeyekî bo rizgariya neteweyî li pêşberî azadiyê de kirnoş bir. Di nav pirse û sersaxiya wî de, min pîreke kinc xakî, û bi heybet û bi bîrûbawer dît, ew jî mamosta Ebdulrehmanê Lahîcanî bû, qehremanê nava reş çalên taxût, û berxwedanvanê şoreşa nû bû. Bo mergê Muradê taqane nagrî, û matembar nabe. Rû li çeperên xwe û şehîd dibêje: "Murad" nîgeranî ji dilê min de derkir, û serê min bo heya heya bilind kir. Hekî em bixwazin ji bindestiyê rizgar bin, hizb û Kurd û Kurdistan xortên wiha dixwaze. Here xortê min, min tu spartî Xwedê, gerdena te aza be.

Muradê şoreşger jî leşê wî bixwîn û birîna wî giran e, û li ser pişta hespekî bi awirên xwe, rû li hevçeperên xwe dikir, û digot: «Herin min bi cih bihêlin, sibehî ye, û hekî dinya rohn be, derketina we zehmet e«. Di demekê de, ku xwîn wekî 'kele kîvîyekê', dilop dilop ji laşê wî dihate xwar digot, çeka min li cem min danên, herin bila zirar ji vê zêdetir nebe, dema ku

got ku te hajê dê û bavê min ê pîr hebe, û dildaniya bide ber dilê wan, bi jin û zarokên min re bigihîje, û emanetê te, xûşka min ya taqane be, ew dawî gotinên Muradê fermande bûn.

Êdî bi yekcarî çavên xwe li ser hev danîn û ez bi cih hêlam. Bo gencekî wekî min di vê serdemê de, ew yek bo min hem erk û hem jî xemeke giran bû, û hertim di nav mêjiyê min de dihat û diçû, û ew hinda ku min karî, min ew erk bi cih anî, û heya wê dema ku "Leyl" ji çiyastan û "Mecnûn" ji Germiyanê bû, û Mecnûnê koça dawiyê kir, qeder ew bû ku Leyl ji Rojhilata Kurdistanê ve, bona himbêzkirina Mecnûn rû bike Başûra Kurdistanê, û li rex hevdu li himbêza dayîka nîştiman de bisitirin.

Baxê Murad jî, îro rojê xemiliye, û ber gertiye, kî-ê dihate bîra wî, ku Helîme çar mehan piştî şehîdbûna bavê xwe ji dayîk dibe, dema ku çavê xwe bi rûyê dinyayê vekir, bavê xwe tê de nedît. Wî bi wêne bavê xwe dît, li himbêza dapîra xwe de mezin bû, û hewrazê zanîngeha hiqûqê birî û niha bi pênûsa rengîm, serpêhatiya jiyana bav û bapîrên xwe, û henase sariya dapîra xwe dinivîse. Taqane xûşka wê jî bû yek parçe moral, û jîrane li pişt hevjînê xwe sekinî, û milê xwe da ber vê xembariya mezin, û rûsorane di cerbeyên jiyanê de çiriskî.

Payîz e, û bi ser kul û kesera Murad re, cardin birîna Resûl e ku li ser laşê me birîneke nû vedike. Seqiz sirr, Tîleko mat û bêdeng. Deşta Koyê, xembar e, Bîngul çavrê ye, û Hewlêra Hûlako û DAÎŞ bezîn, himbêz jê re vekiriye, Şêxan pirça al ya xwe verot, û Şingalê jî destên xwe bi aramî, bi ser rûçikê xwe de tîne, û Rojhilata birîndar ya Rasanê jî, li ser piyan sekinî ye, demek bû me dixwast ku em bêhnekê vedin, û li ber sîbera

çepgerdûn, rê neda, û xew ji çavan herimî, û reşebayê bahoza DAÎŞ'ê rabû, û pirça yek ji şêneyên nû verot. "Arsan"ê taze pêgirtî, kena li ser lêvan nema, û kotra min ya spî ji hêlûna xwe bîhanî bû, û hevala min ya îxtiyar jî, cardin himbêza wî bi xeman hate dagirtin, û Gullale jî baskekî din ê wê şikest.

Ho hevalo, tu bi bê xatirxwastin, ber bi seferekê ve çûyî, ez bawer nakim ku ew xebara rast be, û eva dawî xatirxwestina te be, û ez li nava koma kur û keçên dil pirr ji evîn a fêrgeha te, li te geriyam, da ku te bibînim û bînim, dema ku min ji xwendekarên Rojhilat ên nava kolêja Hewlêr pirsî gotin ku, kanê ew kesê ku hişkegirêyên kêşeyan ji me re vedikir, dema ku min rû li pirtûkxaneya gîştî ya Azadiyê kir, bi sedan pirtûkan devê xwe vekirin, û devsa penceyên te nîşanî min dan, dema ku min serî li sekretariyetê derxist, gotin kadrê herî cihê baweriyê, û herî aram bû!. dema ku min rû li komîsyona Perwerdehiyê kir, gotin ku endamê herî çalak bû. Dema ku min rû li komên xelkê kir, gotin pêşmergeyê herî xelkî û xakî bû. Dema ku min serdana çiya û fêrgehê da, dersxwanan rondik rijandin, û gotin ku mamostayê herî xwedî exlaq bû, ew e ha, pênûs û kilasora wî her li ser maseyê ne, bo sefereke betal, û dema ku kete rê, got ezê zû vegerim û xatir ji me nexwast.

Derengiya şevê telefona min zeng xwar, min hilgirt, û ew bixwe bû, remz û razek di navbera me de hate gotin, dawî gotina wî ew bû ku nîgeran nebe, tenê kêmek hişyarî pêwîst e, û halê Arsan ji min pirsî, min gotê herwisa çav li rê ye, her ku zenga derî tê lêdan, bilez dibeze, wisa difikire ku tu bixwe yî, da ku wekî caran bi te re bilîze, lê êvariya 5'ê Xezelwerê hinek hevalan serî li min dan, ku xem li rûyê wan dibarî, û rengê wan sîs bibû, û bi zehmet dikarîn qise bikin, û yek ji wan hêdî xwe nêzî min kir û di guhê min de qiseyeke nexweş çirpand û guhê min zingîn lê hat, gote min mixabin Resûl.... bo min xebera mergê wî ji xebera şehîdên Rasan bijantir nebû, ez bilez rabûme ser piyan û ber bi sekretariyayê ketim rê, bo hemşêvriyê, û bona rêûresma bi axê spartina wî, lê li cem min 'Kinêre' ji askên bênaz ên 'Rasan'ê zêdetir nebû, Arsan jî ji Arsanên wan bênaztir nebû, lê dilê min wekî Bûrkanekê, û rûmetê min jî sor, lê serbilind im.

Temenê min jêhel çûye, û gefa mirinê li min dike, dema ku min rêvîngeke mandî dît, her ji Tîlekû ve heya Koyê, bi bê bêhnvedan rê biriye, got: "Ey Tofîq, di vê rojê de ku te ez mîna kopal piştkûr kirim, Resûl jî her di vê rojê de pişta min şikand, kî dibêje ku dîrok ducarî nabe!?. Min got, ne, em li kûreya jan û êşan de heliya ne, û hûn jî wekî Qendîlê ne, û Qendîl jî ne diçeme, û ne dişkê, û qet jî ji nav naçe. Eva Arsan e, ku kopalê destê te ye, di şevê de ronahiyê dide ber piyên te, di ronahiyê de jî, pêngav bi pêngav, li binevrazên tîk serkeve, û li ser cihên asê û li ser lat û zinaran jî xwe pêve bigre, û serî li Gare û Metîn derxe, û li Bîngola Bakur binêre, ku du pêşmergên sînornenas dest dane hevdu, û devkenî ne, û Rojhilat, Başûr, Rojava û Bakur serî ji bo wan ditewînin, ew jî lêvken in, û dibêjne karwanê Rasanê, ku karwanê rizgariyê û vegeriyana herêmên veqetiyayî ên Başûr, wekî rûbarê Sîrwan diherike, Arsan jî yekem yadgarê min e, û kila çavê min û sebra ber dilê we ye. Têbînî:

-Mela Ebdulrehman Lahîcanî bavê şehîd Murad û girtiyê siyasî, zêdetir ji 60 salan temenê xwe bo xebata di nava PDKÎ de danî. Di goristana şehîdan a PDKÎ de, li gel hevjîna xwe li rex hevdu bi axê hatine spartin.
-Mam Mehmûd jî bavê şehîd Tofîq û Resûl Mihemedzade ye

Karkerên “Aq Dere” ku şelaq xwaribûn, niha jî bêkar in

Piştî vê ku karkerên “Aq Dere” şelaq xwarin, û vê yekê dengvedaneke zaf di ragehandinên giştî de li pey xwe hebû, biryar bû ku ew vegerin ser karê xwe, lê niha jî bêkar mane.

Li gora nûçegihaniyan, ew karkerên kangeha “Aq Dere” ya şaristana Tikabê, ku li ser bingeha dozvekirina xwediyê kar li dijî wan, derbên şelaqan tab kirin, û vê yekê civaka kedkarî hejand, û ew cezakirin jî bi sedema birêvebirina meşeke nerazîbûnê ji aliyê wan kedkaran ve bû, niha jî bêkar mane.

Herçend ku hukmê girtina wan piştre hate hiloşandin, lê hem bêkar mana wan, û hem jî li ser kar vêdenebirina birêveberê giştî ê îdareya kar, civaka kedkarî êşandiye.

Husên Hebîbî çalakê kedkarî ku bi mehan e, rewşa kedkarên “Aq Dere” dişopîne, derheq vegerandina wan kedkaran bo ser kar dibêje: “ Li ser bingeha biryara heyeta çareserkirina kêşeyan ya îdareya “Kar” wan kedkaran mafê vê heye ku vegerin ser kar, û heqdestê wan çend mehan bêkarmanê jî wergirin, lê xwediyê kar gotiye wan, em ne karkeran dixwazin, ne jî pere didin”.

Kedkarên şelaq xwarî û bêkar ên Tikabê dibêjin, di kangehekê (me’idenekê) de ku 240 kes kar dikin, em pênc kesê cezakirî bêkar in, û ciyê me tuneye, û niha em nikarin koçberî bajarên dine jî bin bo karkirinê.

Rûsiyê nivîsîngeha rêxistina Lêborîna Navdewletî di Moskoyê de daxist

Destthilatdarên Rûsiyayê,nivîsîngeha rêxistina Lêborîna Navdewletî daxist,ji ber vê ku ew saziya Mosko bi berdewamî bi pinpêkirina mafê mirovan tometbar dike, di dema encam dayîna êrîşên esmanî yên li ser Sûriyê de.

Her çend hikûmeta xwecihî ya Moskoyê ragihandiye,ku bi sebeba nedayîna kirêya vê nivîsîngehê, ev nivîsîngeh hatiye daxistin,ku berê jî çend caran bi nivîsên fermî, ji ber paşdexistina kirêya nivîsîngehê, hişyarî dabûne nivîsîngehê.

Di dema ku karmendeke wî nivîsengehê diçe ber deriyê nivîsengehê, dibîne ku derî hatiye daxistin, û berqa wê jî hatiye qetkirin.

Con Dalhuyîzin,rêveberê wê rêxistiê dibêje, “Ev bûyere bê mînak e, û heyanî niha tu agadariyek di derbarê wê rêxistinê de, bi me nehatiye ragehandin”.

Herwiha dibêje: “Me hemû belgename hene, ku me hemû mehan kirê daye”.
Hêjayî basê ye ku Rûsiye bi sedema binpêkirina mafê mirovan, nekarî vê care di civîna Civata Giştî ya NY de bibe endam, di civata mafê mirovan de. Lewra renge vê yekê, Rûsiye êşandibe, û anîbe ser vê baweriyê ku nivîsîngeha vê saziyê dabixe.

Behayî berdewam di bin zexta rejîmê de ne

Di heyama çend rojên borî de, aliyê kêm 24 nawendên pîşeyî ên hevwelatiyên Behayî li bajarê Sarî de hatine polompkirin.

Li gora nûçegihaniya “HRAN”, nawenda nûçeyan ya mafê mirovan di Îranê de, di rojên 11 û 12’ê Xezelwerê de, ku roja jidayîkbûna avakerên ayînê Behayî ye, aliyê kêm 24 nawendên pîşeyî ên hevwelatiyên Behayî ên Sariyê ji aliyê organên Întizamî ve hatin polompkirin.

Hêjayî basê ye ku xwediyên nawendên pîşeyî, çend rojan berî vî rêkewtê, serdana îdareya Emakin ya vî bajarî kiribûn, û bona nîşandana niyetpakiya xwe, îdareya “Emakin” ji rojên xwe ên bêhnvedanê pê hesandibûn. Ew kiryara rejîma Îranê di demekê de ye, ku li ser bingeha benda B madeya



28 ya yasaya sîstema pîşeyî, xwediyên nawendên pîşeyî dikarin, heya 15 rojan di salê de nawendên xwe dabixin. Behayî jî mixabin wekî peyrewên mesebên din berdewam di bin zexta rejîma Îranê û siyasetên wan yên dijîgelî de ne, û rastî lêdan û îşkence û girtinê tên.

Bûyera kar, jiyana nzarokeke temen 4 salî jê stand



Şeş kes ji du malbatên Kurd bi sedema bûyera kar, li parêzgeha Qezwînê bûne qurbanî.

Li gora nûçeya ku gihaye Ajansa Nûçegihaniya Kurdpayê, piştînîvroya Pêncşemiyê 6’ê Xezelwerê, bi sedema teqîna gaze, li yek ji kêlgehên mirîşkdariyê, li gundê “Rûdek” ya “Boyîn Zehrayê, şeş kedkar bi giranî birîndar bûn.
demjimêrek piştî vê bûyerê ye yek ji birîndaran, ku zarokekî temen çar salî bû, li dema veguhastinê bo nawenda dermanî ya Qezwînê jiyana xcwe ji dest da.
Ew hevwelatî ji kedkarên demsalê bpn ku ji bajarên wekî Mehabad û Serdeştê ve rû li Qwezwînê kiribûn.

Di vê bûyerê de, sê jin û du mêr jî birîndar bûn. Li gora vê raporê tewahiya kelûpelên van du malbatan , di agirketinê de, bi tewahî şewitî ne.

Herwisa nûçegihanê Kurdpa ragehandiye ku tu yek ji qurbaniyên bûyera kar li dewacîna Boyînzehra de, li bin çavdêriya Saziya Bîmeya Civakî de nebûne.

Berhema Şehram Nazerî amade ye

Karên albûma nû ya hunermendê navdar ê kurd, Şehram Nazerî ber bi dawiyê ve diçe û tê gotin ku dê dimekê nêzîk de bê belavkirin.

Rêveberê şîrketa Perdîs Erdewan Ceferî ku sponsoriya berhema nû ya hunermend dike, ji medya Îranê re ragihand: "Ev sal û nîvek e em bi vê albûmê ve mijûl in.

tekstên stranan ji helbestên Ebû Seîd Ebulxeyr hatine wergirtin. Mûzîk jî ji aliyê orkestraya flarmonîkî ya çekî ve hatiye amadekirin ku 70 jenyarên amêrên mûzikê beşdar bûne."

Li gorî gotina Caferî karê dabeşkirina mûzikê ya vê berhema nû ji aliyê Emîr Pûrxelecî ve hatiye kirin. Tê pêşbînîkirin di meha Rêbendanê de album bikeve bazarê



Matar: Min ji strana Pêşmerge pere nestand

Stranbêja lubnanî Hasna Matar, îdiya ku "pere ji strana li ser pêşmerge gotiye wergirtiye" red kir.

Stranbêja lubnanî Hasna Matar ji Rûdawê re got, wê strana derbarê pêşmerge de bi şanazî gotiye û lixwekirina cilên kurdî jî ji bo wê serbilindî bû.

Hasna Matar wiha got: "Ez li Hewlêrê dijim. Heger min li ser pêşmerge stran negotiba wijdana min rihet nedibû."



Li ser îdiya ku pere wergitiye jî Matar wiha axivî:
"Ez li ser vê îdiya şeqiz mam. Ma çawa dibe hunermendek ji bo pere fikra xwe biguhere û strana bibêje. Min ji bo vê stranê ti pere nestandine. Ev îdia derew e."
Stranbêja navdar çend caran li eniya şer serdana pêşmerge kiribû. Beriya niha jî Hasna Matar straneke kurdî bi navê "Tenêtî" gotibû.

Helbestvanê dildarê yekîtiyê: Mele Nûriyê Hesarî

Besam Mistefa

Mele Nûriyê Hesarî yek ji helbestvanên klasîk yên navdar yên Rojavayê Kurdistanê ye û navê wî bi rêzgirtin cihê xwe li tenişta navên Seydayê Cegerxwîn, Tîrêj, Keleş û yên din digire.

Mele Nûrî zimanzan, helbestvan û nivîskarekî pir berhem bû, lê hemû berhemên wî hîn nehatine çapkirin. Mele Nûrî herdem li ser nebûna yekîtiyê di nav kurdan de dinaliya û dikir hawar.

Mele Nûrî di hemû berhemên xwe de, nemaze di dîwana "Zevîyek Gazîdan" de, her û her xema gel û welatê xwe dixwar û herî zêde li ber mijara parçebûn û nebûna yekîtiyê di nav gelê Kurd de disekinî û dinaliya û wiha digot:

"Hey Kurd hewar e qey ne bes ev sedê sala diçin. Hîn jî tû xweş nabî şiyar ev perçebûn bona çi ye? Kurd Kurdê kû dijmin nebî çaxê li wî tû ewle bî. Ê Kurd nekî yek bê ked e destê hevalan bernede. Têr û xizan îro yek in, kes guh nedin meznatiye."

Mele Nûrî zilm û stemkariya dijmin û neyarên gelê Kurd jî herdem bibîr dianî, lê ew bêhtir li ser dabeşbûna kurdan bixwe radiwestiya û ew wek sedemeke sereke ya rewşa kurdan û bindestiya wan didît û digot:

"Kurdê xizan û dolemend tevde di bin zorê de ne. Kû hûr û gir tev nebine yek em bê hebûn û berze ne. Hê Kurd niha wek sêwî ye bê nav û ax û dewlet e. Ev perçebûn bona çi ye, yektî ji bo Kurd babet e."

Mele Nûriyê Hesarî ku serxwebûn û rizgariya milet û welatê xwe dixwest, hertim gazin ji derdê neyekbûn û hevnegirtina kurdan dikir û digot:

"Derdê me îro yektî ye bo Kurd nebêjin ev kî ye. Navê me bê cîhan bes e ev çi kul û berberî ye. Kî qenciyê bo Kurd bikî ew rohniya çavê me ye. Rûs û Emêrkanî yek in ka kî bir û bavê me ye!"

Mele Nûriyê Hesarî di sala 1934an de li gundê Hesarê yê girêdayî Kerecosê ji dayik bû û wek Seydayê Pirêşan jî dihat naskirin. Ji destpêka sala 1967an ve li bajarê Qamişlo jiya heta sala 2011an li taxa Qenat Siwêsê li Qamişlo koça dawî kir û li goristana Qidûrbegê hat veşartin.

Gotinên Navdaran

A: FIRAT CEWERÎ

Destpêkirin, nîvdawîanîn e.
ovidius Horatius

Em ji her kesên ku me diecibînin hez dikin, lê em ji her kesên ku em diecibînin hez nakin.
La Rochefoucauld

Ger hûn dixwazin bila her kes bi başî behsa we bikin, wê çaxê hûn behsa xwe mekin.
Pascal SSHer

tim hinin din mînak bidin.
D.Carnegie

Ji berdêla tu ê hin tiştan nîvî bizanibî, bi tiştekî nizanibe çêtir e.
Nietzshe

Em nizanin em ê bi çi bin, lê em dizanin em çi ne.
Shakespeare

Yên ku zanebûna wan zêde dibe, derdên wan jî zêde dibin.
încîl

Yên ku hinin din bizanibin zane ne, yên ku xwe jî izanibin biaqil in.
Lao-Tsze

Ma qet zane û nezan dibin yek?
Hz.Muhammed

KURMANCIYA BAKUR

Mîrza Firat

Kurmanciya Bakur Em bi gotin an biwêjekê dest bi meramê xwe vegotinê bikin. Tê gotin ku, tu li seyareya kê siwan bibî, tu yê strana wî guhdarî bikî. Gellekî rast e.

Qey mirov dibêje ev gotina ji bo Kurmancî, zaravayê Kurdî hatiye gotin. Her çiqas seyare a me be jî, ji ber ku ajovanê seyareya xwe ne em in, em di seyareya xwe de, yanê li ser xaka bav û kalên xwe, stranên ajovan yê Ecem, Ereb û Tirk guhdarî dikin. Tenê xaka me nekirine çar parçe, çand û zimanê me jî kirine çar parçe. Rasterast, bandora serdestan li ser zimanê xwe em dibînin û dijîn.

Pirs ev e; Gelo çima Kurmanciya Bakur, ne wek Kurmanciya Baþûr, Rojava û Rojhilat kûbar e û qeba ye? Peyv û hevok heman bin jî, çima di Kurmanciya Bakur de tehm, þêrinî û kûbarî tine? Heman ziman û zarave ye, lê ewqas ferq çima?

Dema ez li ser televîzyoneke Kurdî, Kurdên Başûr an Rojava temaþe û guhdarî dikim, gellekî kêfa min bi peyivandina wan tê û mîna ku þekirê Amedê bavêjime devê min, tehmeke bêhempa berdide devê min û mîna ku ez muzîkeke zor baþ guhdarî dikim, ez mest û kêfxweþ dibim. Lê dema Kurdekî Bakur guhdarî dikim, ez pirr caran eciz dibim. Wek motoreke ku gemar tevlî sotemeniyê bûbe, tu dibêjî ha motorê stop kir û sekinî. Çimkî pirranî Kurdên Bakur, bi tirkî difikirin û bi Kurdî diaxifin. Û bi þêweyekî qeba Kurdî dipeyivin. Ev ne qebatiya zimanê me ye, ev þerma me Kurdên Bakur e. Ez bi xwe li hemberî vê rewþê gellekî xemgîn dibim. Heman peyv û hevok, di devê Kurdekî Rojava an Baþûr de, ewqas þêrîn û delal û kûbar. Mixabin di devê Kurdekî Bakur de bêtehm û qeba ye. Mirov nikare vê tenê bi bandora zimanê serdest ve girê bide. Rojekê bi hevalekî ne Kurd re em rûniþtibûn û me televîzyon temaþe dikir. Di televîzyoneke Kurdî de, me hinekî axaftina çend Kurdên Bakur guhdarî û temaþe kir. Heval, li min mêzekir û got, “qusurê nenêre lê zimanê we pirr qeba ye.

Ez di şûna xwe de sar bûm û hinekî jî sor bûm. Zor zora min çû lê mafê Sezar em bidine Sezar, rast digot, ez jî wek wê difikirîm lê bi ferqekê. Ew qebatiya ji zimanê min nedihat, ji kesên ku dipeyivîn dihat. Min ji heval re li ser înternetê, cuda cuda televîzyonên Kurdî vekirin û bernameyên cuda da temaşe û guhdarî kirin. Çi axaftinên Kurdên Başûr, çi yên Rojava û Rojhilat. Heval matmayî ma. Bi guhê xwe bawer nekir. Îcar ji min re got, gelo çawa dibe ev heman ziman be?

Dewam kir, çiqas zimanekî şêrîn e. Heman ziman û zarave, lê wek ferqa şev û rojê. Ez texmîn dikim, her zimanê dayikê yê her mirovî, ji bo wî şêrîn û delal e. Tehm û şêriniya zimanê xwe mirov nikare di ti zimanên din de bibîne. Mixabin, em Kurdên Bakur, qesta min ji bo pirraniyan e, helbet mirovên ku zimanê þêrîn, delal dipeyivin hene, ew li derve lê pirranî zimanê xwe yê xweþ awaz û þêrîn û naz diherimînin. Tiþtekî din jî heye di vê mijarê de. Dema ku bi Tirkî dipeyivin Kurdên Bakur, çiqas xwe kûbar dikin, qet tu dibêjî li Stenbolê mezin bûne lê dema vedigerine zimanê xwe, ne kbarî dimîne ne jî şêriniya ziman.



Tiştonek

A: Mahir Berwarî

1- Şeq şeq şeqşeqî, kete erdî, erd peqî.

2- Sed terim yê di tabîtekê da.
- Çum bajarê lakêşe, hemî mirovên li wir, ser sor in bin sipî ne.
- Ji zigê diya xwe derdikevit, pişta babê xwe diperixînit.

3- Diya mirî, devê beş.

4-Vî alî dar, wî alî dar, di navda 2 têşkêt har.
Hêrve dar wêve dar, yê di nav da kûçkê/seyê har.
- Ji vê ve dar e, ji wê ve dar e, yê di nav de seyê har e.
- Ga di gelî da, gelî dirizit, ga narizit.

5- Hêrve ax, werve ax, di navda mîr bidax.

6- Ho dilivit, ho dicivit, ezman nîne pê baxivit.
- Herîşan û perîşan, cihê axa û feqîran.
- Siwarê me bi nîşan e, li ser maîna bê giyan e.

7- Helotirr, melotirr, sîng sipî yê mil kutir,
li hemî zevvya dikit tirr. (* bo gûzanê ji dibêjin)
- Mam hesenê bi lingekî, çû şerê gondekî.
8- Hindî dikêşit, xilas nabit.

9- Helhey har e, reşwêley siyar e.

10- Dara du tayi, di te hildayi.

11- Ya zer e, li guştî hate der e, ya bi per e, ya kêm ser e.

Xwendevanên hêja!
Hûn dikarin bersiva tiştonekan bi riya E-Maila Agiri2003@gmal.com ji me re bişînin

Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (289)